

# ALSO

Arbeitslosenselbsthilfe Oldenburg e.V.  
Beratung im Landkreis Vechta

Fon: 0157 - 834 206 82  
Mail: lk-beratung@also-zentrum.de  
www.also-beratung.de



## Thema: Unterkunfts- und Heizkosten 2016

**Bûhayê Kirê ji 1. Çile ya 2016 ve Bilind dibin Di**  
Lîsteya jêrê de, bilindbûna Sînorên jor, ji bo Kirê ya sar û mesrefên din ( bêyî heqê Kehreb û germkirinê), ji bo ya li Bajarokê Vechta û li derdora wê, ji 1. Çile ya 2016 ve te diyarkirin.  
Encam: heta niha, eşkere nebûye, bê wê Alg II û Alîkarîyasosyal, heqê Kirê yan jî beşekî wê yî mezin hilgirin ser xwe, yan na.

### Ji nêzîk ve nerîn: Bûhayê Kirê çewa dighê sînorê bilind?

1. Ji 1. 1. 2016 ve, sînorên bûhayê Kirê yê heqêrûniştinê (WOG) derbasdibe. Bi taybetî li **Lohne** bûhayê sînorên Kirê bilind bû, nema wekî berê di 2015 de, di Koma Kirê yan nizim de, lê di ya asta bilind de wek ya Bajarokê Vechta de hat bicîhkirin (Lîsteya berevajî).

2. Li ser Sînorên Kirê yê heqêrûniştinê, piştî dozên berdewam yê Dadgeha sosyal ya Heremî ji sedî 10ê wê hat rakirin. **Destpêkê bi vê ji sedî 10 kêmkirinê, Sînorên Kirê Ji Alg II û Alîkarîya sosyal dighên deverên Cûda.**

3. **Sînorêheqêgermkirinê** ya sala 2016, bûhayê nirxê Kalûpelê şewitandinê 1,57€ (li cem Gaz), bi mezinbûna Xanî ve tê li hev dan ( Lîste ya jêr ya rastê). Mezinbûna Xanî li gorî zêdebûna Kesan pir dibe 50, 60, 75, 85 û 95 Metreçarçîk. Ji bo her Kesekî zêde di Malbatê de 10 Metreçarçîk heye. Ji ber wê jî, girêdayî mezinbûna Xanî, nirxê heqê germkirinê ya Navenda Kar biserûber nîşan dike, dertê navê.

**Encam:** Bi hatina Sala nû ve beşekî girîng ji Sînorên Kirê jî bilind dibe. Bilindbûna wê girêdayî hejmara Kesên bi hevdû re dijîn (Nirxê Lîste ya vê pelê û ya di dû ve tê bidin berhev). Sînorên bilind yê Kirê, ku bi heqê Rûniştinêve girêdayî ye û li cem Alg II û Alîkarîyasosyal bilindbûna Kirê ya di salên dawî de, dide pê.

Nêzîkbûna Navenda Kar ya Vechta li ser Pirsê, li ser esasê mezinbûna Xanî û Kirê ya germe.  
Encam: Ger Kirê ya bingehîn bilind be û heqê germkirinê nizim be, dikare tevahîya wan esas bê girtin. Kirê ya sar li Vechta ji 410 € (= 23,90 € li ser sînorê Kirê ya sar) wê tenê 50 Euro li ba

### Sînorên bilind ji bo Mesrefa Giştî li cem Heqêrûniştinê û ewlehîya bingehîn 2016

Li gorî hejmarê Mesrefa Malê	Sînorên bilind ji bo Bakum, Damme, Dinklage, Goldenstedt, Holdorf, Neuenkirchen-Vörden, Steinfeld, Visbek (Wekî Euro)		Sînorên bilind ji bo Bajarokên Lohne û Vechta (Wekî Euro)		mezinbûna Xanî
	Heqêrûniştinê	Alg II	Heqêrûniştinê	Alg II	
1	312	343,20	351	386,10	50
2	378	415,80	425	471,50	60
3	450	495,00	506	556,60	75
4	525	577,50	591	650,10	85
5	600	660,00	675	742,50	95
Zêdebûn ji bo herkesekî zêde	71	78,10	81	89,10	10

heqê germkirinê ya Mehane esas bê girtin. Heta 79 € heqê Germkirinê tê naskirin. Kirê yê ji 460 € dikevi bin Sînorên Kirê ya germ 466-€.

**Wekîdin:**

**Heqê Germkirinê yê pêwîst wê bèn hilgirtin**

Ji bo nîrxê sînorê germkirinê ji 1,57 € serê Metreçarçik ya Xanî, divê neyê jibîrkin û li gorî pêwîstîyê, nîrxê herî bilind yê heqê Germkirinê bê daxwazkirin. Di Rewşên ji alîyê me de hatine naskirin, wekî nîrxê gelekî bilind yê heqê germkirinê, ji ber rewşa nebaş ya Xanî ( mînak: Derî û Pencereyên ku baş nayên girtin, Dîwar û Zemînen ku germahîyê neparêzin), Pergalên kevin yê germkirinê yan jî Kalûpele Şewitandinê yê biha. Di van Rewşên ku ne di berpirsariya Kirêci de ne, Sazî ya Kar û Sazî ya Sosyal heqê germkirinê qebûldikin. Di Sala 2016 Saziya Kar ya Vechta li gorî cûrê Şewitandinê, Sînorên nîrxên Cûda, li gorî Metreçarçik ya Xanî: ji bo Gas 1,57 €, ji bo Kehrebê 1,85 € û ji bo Neft 1,64 € hildigre serxwe.

Gefördert durch:



Niedersächsisches Ministerium für Soziales, Gesundheit und Gleichstellung

**ji 1.1.2016 Zagonên nû**

Zagonên nû ji 1. Çile pêde derbas dibe. Mehane ji bo Kesên bi tenê 404 €, ji bo 2 Kesa 364 €. Ji bo Zarokên ji ser 18 û bin 25 Salî, ku hîn li cem Dê û Bavê xwe dimînin 324 €, ji bo Zaroken di navbera 14 heta 17 salan 306 €, ji bo yê ku ji 6 heta 13 Salî 270 €, ji bo yê 0 heta 5 Salî 237 €.

**Ji kengî û pêve Sînorên Kirê ya bilind derbas dibin?**

Bi diyarkirina guhertina Zagonên nû, herî dereng

dive ji 1. Çile ya 2016, ji Saziya Kar bê nîşankirin û ji bo herkesî, yê ku heta niha heqê germkirinê bi giştî nehatîye hilgirtin, Kirê ya bilind bê hesibandin. Em pêşniyarî Herkesî dikin, berê xwe bidin, Name yê Alg-II yan jî, Alîkarîyasosyal, bê Kirê, Mesrefa zêde û heqê germkirinê, yê ji 1. Çile virde bi tevahî hatîye hesibandin. Ger Kirê ya we, heqê Germkirinê nehatibe hesibandin, divê ji 1.1.2016 pê de, heqê Kirê ya sar û Mesrefên zêde, li gorî van Liste yê hatine dalqandin bèn qebûlkin.

**Ji bo Pirsên we yê wekîdin, em bi kêfxweşî alîkarîya we dikin. Şewirmendê we yê ALSO**

\* „Kirê ya sar, di wate ya Kirê ya bi mesrefên din û bê yî heqê Kehreb û germkirinê”.

**Nerînek li ser dema Borî: di Sala 2015 de Sînorên bilind (wekî Euro) wûsa bûn**

li gorî hejmarê Mesrefa Malê	Sînorên bilind ji bo Bakum, Damme, Dinklage, Goldenstedt, Holdorf, Lohne, Neuenkir.-Vörden, Steinfeld, Visbek (wekî Euro)		Sînorên bilind ji bo Bajarokê Vechta (wekîEuro)		Sînorêheqêgermkirinê (ji bo Gas) li gorî mezinbûna Xanî- 1,57 € serê m <sup>2</sup> Wekî Euro
	Heqêrûniştinê	Alg II	Heqêrûniştinê	Alg II	
1	292	321,20	308	338,80	78,50
2	352	387,20	380	418,00	94,20
3	424	466,20	451	496,10	117,75
4	490	539,00	523	575,30	133,45
5	561	617,10	600	660,00	149,15
Zêdebûn Ji bo herkesekî zêde	66	72,60	72	79,20	15,70